

T ê k o ş e r

Hejmar 40

Heziran 1988

Dosya Halabca



revue trimestrielle

N° 40

Driemaandelijks blad

Têkoşer : Kovara Têkoşer, yekitiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljika
Navnîşan : rue Bonneels, 4 - 1030 Bruxelles
Navnîşana Postê : B. P. 33 - Zellik
Tel : 02/230.89.30
Buha : 50 F.B.
NO bankê : 426-3144071-85 - K.B. - Belgique
Berpirsiyar : M. Nezih Yalçin
Komita nivîskariyê : Derwêş, Nezih, Pervîn

N a v e r o k

Halabca li Parlemeta Ewropa		3
Halabca : Xebat li Beljika	Pervîn	5
Hevpeyvin bi Prof. Heyndrickx re	Derwêş	8
Dîroka Kurdistanê di Ansiklopêdiya Islamê de (XII), Civaka Kurdî (4)		10
Nêçir	Osman Sebri	15
Helbest : Lo Kurdino !	Şahînê B. Sorekî	21
Rêzimana Kurdî (XIII), Nişank li ser parekan (2)	C. Bedir Xan û R. Lescot	23
Xebata me		28
Têkoşer'den haberler		30

S o m m a i r e

Halabdja au Parlement Européen		3
Halabdja : Activités en Belgique	Pervîn	5
Entretien avec Prof. Heyndrickx	Derwêş	8
Histoire du Kurdistan dans l'Encyclopédie de l'Islam (XIII), la Société kurde (4)		10
La chasse chez les Kurdes	Osman Sebri	15
Poème : O Kurdes !	Şahînê B. Sorekî	21
Grammaire kurde (XIII), remarques sur les particules (2)	Dj. B. Khan et R. L.	23
Nos activités trimestrielles		28

I n h o u d

Halabdja voor het Europees Parlement		3
Halabdja : Activiteiten in België	Pervîn	5
Interview met Prof. Heyndrickx	Derwêş	8
Geschiedenis van Koerdistan in de Encyclopedie van de Islam (XIII), de Koerdische samenleving		10
De jacht bij de Koerden	Osman Sebri	15
Poësie : O Koerden !	Şahînê B. Sorekî	21
Koerdische spraakkunst (XIII), bemerkingsen bij de partikels (2)	Kh. en Les.	23
Onze driemaandelijke activiteiten		

ISSN 0773-3887



Membre de l'Union des Editeurs de la Presse Périodique
 Lid van de Unie van Uitgevers van de Periodieke Pers

Halabca li Parlementa Ewropa



Di mêjuya 14 Nisan 1988 de, di civîneke gîstî ya Parlementa Ewropa, li Strasbourg, de, bi pejirandinê (qebûlîkirin) hema te-

vayiya parlementerên, hikûmeta Iraqê, ji bo bikaranîna çekên şimik û qirkirina gelê kurd li Halabca, bi awakî gelek vekirî û xurt hat

mahkûm kirin. Em li jêr metnê vê biryarê weka xwe, bi inglîzî, diwêşînin :

RESOLUTION

on the use of chemical weapons in the Iran-Iraq war

The European Parliament,

- having regard to the international convention on the prevention of the crime of genocide adopted by the United Nations General Assembly in Paris on 9 December 1948,
 - having regard to the Geneva Protocol of 17 June 1925 prohibiting the military use of toxic, asphyxiant or similar gases and bacteriological substances and Resolutions 2162 B (XXIV), 2603 A (XXIV) and 2603 B (XXIV) also adopted by the United Nations General Assembly,
 - having regard to the Declaration adopted in May 1987 by the United Nations Security Council condemning the use of chemical weapons in the war between Iraq and Iran,
 - having regard to the numerous resolutions by the European Parliament demanding a total ban on chemical and bacteriological weapons,
- A. whereas since 1980 a bitter war has been in progress between Iran and Iraq, resulting in the deaths of many hundreds of thousands of men, women and children and in the injury and suffering of countless others,
- B. outraged that the Iraq government has immeasurably increased the horror of this war by the use of chemical weapons in particular during the air raids on 16/17 March 1988 on the Kurdish town of Halabja and other places situated in Iraq territory, but at that time overrun by Iranian forces,
- C. whereas these air raids are reported to have cost 5 500 lives and to have injured thousands of other people, mainly among the indigenous Kurdish population,
- D. distressed by the atrocious sufferings of hundreds of victims who have suffered burns to their eyes, lungs and their whole bodies and who in most cases will die as a result or will suffer for the rest of their lives from the irreversible effects of the gases which have affected their nervous and blood systems,

- E. deeply shocked at the evidence that the Iraqi Government has started what amounts to a war of extermination against the Kurds of Iraq by using chemical weapons and by carrying out mass executions of prisoners,
 - F. aware of the danger of the increasing use of missiles in the so-called 'war of the cities' and more generally concerned by the fact that the Middle Eastern countries possess even more sophisticated intermediate-range weapons such as CSS Missiles in Saudi Arabia, JERICO Missiles in Israel, Silk Worm Missiles in Iran and SS 21 in Syria,
 - G. whereas Iraq and all the Member States of the European Community have acceded to the Geneva Convention which prohibits all use of chemical weapons,
 - H. whereas both sides in the Gulf war are reported to be capable of manufacturing and delivering chemical weapons,
1. Condemns in the strongest possible terms the use of chemical weapons by Iraq in flagrant violation of international law;
 2. Calls on the Iraq Government to discontinue forthwith its use of chemical weapons;
 3. Calls on the Iran Government to abjure the use of chemical weapons by way of retaliation or otherwise;
 4. Urges all parties concerned to desist immediately from the use of missile attacks on cities;
 5. Calls on the Council and the Member States of the European Community to adopt measures to put pressure on Iraq and Iran to respect the international conventions prohibiting the use of chemical and biological weapons;
 6. Calls on governments of all Member States to ensure that chemicals and equipment which can be used in the production of chemical weapons are not being exported from their countries to Iran or Iraq;
 7. Calls on the Foreign Ministers meeting in European Political Cooperation to agree urgently on joint action with the states which voted in favour of Security Council Resolution 598 on an immediate cease-fire and to enforce at last an embargo on weapon sales to both belligerent parties;
 8. Believes that the events in Iraq make urgent an agreement on the complete prohibition of chemical weapons in the Conference on Disarmament in Geneva;
 9. Asks the Commission to supply the necessary means forthwith to ensure that the survivors are given medical treatment and social assistance;
 10. Demands that the Council do all in its power to prevent the deportation of Kurds to concentration camps;
 11. Instructs its President to forward this resolution to the Commission, the Council, the Foreign Ministers meeting in political cooperation, the Governments of Iraq and Iran and the Secretary-General of the United Nations.

Halabca : Xebat li Beljîka

Pervin

Ji bo biranina Nijadkujîya Halabca, ku semboleka û awakî nuh e Nijadkujîya Giştî a Gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê ye, li Beljîka, ji aliyê kes û rêxistinên cihê, xebateke dirêj û kûr tê kirin. Di meha Gulanê de, ev her sê xebatên jêrîn hatin kirin :

7 Gulan : Şeveke çandî

Têkoşer konsêreke xweş ji bo biranina Nijadkujîya Halabca û alîkariya tibbî ya birindarên wê, bi rîya rêxistina bijîjkên serbixwe "Médecins Sans Frontières-Belgique", li Passage 44, li Brûkselê, pêk ani.

Şev bi pêşgotîneke kurt, bi sê zimanan : Kurdî

(kurmancî û soranî), fransîzî û hollandî dest pê kir. Hevalek ji Kurdistanê Iraqê helbesteke gelek xweş li ser Halabca got. Piştî, du kesên ku cillên kurdi yê pirr xweşik li xwe kiri bûn çend xulekan (daqe), bi dahol û zurnê, ahengên kurdi yê gelek naskirî pêşkes kirin. Di dû wan de, Koma Nîştîman, ji Arnhem-Hollanda, dilanên kurdi yê xweş û geş pêşkes kirin. Zozan, ji Arnhem, û Bîrader, ji Almanyayê, stranên şoresgerî û evînî stiran. Di dawiyê de, Şivan, bi dengê xwe yê geş dilê besdaran şah kir. Besdar gelek bûn. Ji derveyî Kurdistanê hati bûn, Ermenî, Kildanî, Suryanî, Aşûrî, Tirk, Iranî, Ereb û Beljîkî hebûn û wan, bi hatina xwe û nişandana nê-

zikayî û germiya xwe, îsbat kir ku hevaltiya gelan, nemaze di bûyerên ewha giran de, mumkun e. Di dawiya şevê de, herkes ket dilanê û bi dilekî tije sahi vegebiya mala xwe. Li derveyî salonê, me belge, kaset û silikên kurdi raxitin û xwarin û vexwarin firotin.


16 Gulan : Cîvî-neke çapê

Bi hinceta (munasebet) nivîsina rapporeke gelek hêja ji aliyê Dr Aubin Heyndrickx, mutexessîsê navnetewî yê kartêkirinê (tesîr) çekên simik, ji ONU (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) re, Parlementerê flaman û endamê Parlemanta Ewropa, Willy Kuypers, û

ŞIVAN

CHANTE POUR
ZINGT VOOR

HALABDJA



KOERDISCHE AVOND SOIREE KURDE

AVEC
MET

**BIRADER, ZOZAN,
NIŞTIMAN** (folklore)

Sa 7 mai 20h
Za 7 mei

PASSAGE 44
BRUSSEL / BRUXELLES


Kruisstraat 44,
1000 Brussel
Bd. J. Botanique 44,
1000 Bruxelles

LETS
ARTSEN ZONDER GRENZEN - MEDECINS SANS FRONTIÈRES - ORG. : TÊKOŞER - TICKETS 250/300. INFO (016/20 64 45, 02/230 89 30, PASSAGE 44 02/218 56 30)

Dr A. Heyndrickx, serokê şaxa Toksikoloji ya Zanîngeha bajarê Gent (Gand) û berpirsiyarê projeya UNIDO, civîneke çapê li I.P.C. (International Press Centre), li Brukselê, pêk anî.

Di destpêkê de, **W. Kuypers** Protokola Genevê ya 1925 ku bikaranîna çekên şimik qedexe kiri bû, lê ku bi awakî vekirî li ser "şerrên hundirî" ne peyivî bû, anî bira me. Piştî, wî dûr û dirêj, **projeya xwe** û ya hevalê xwe, **Jaack Vande-meulebroecke**, ji bo **bi-ryareke Parlemeta Ewropa** li ser qedexekirina firotina maddeyên ku ev çek jê çêdibin, "**précurseurs-clefs**", "**sleutelvoorlopers**", pêşan da. Bi ser de jî, wî hebûna **embarên mezin** ên çekên şimik li **Amerîka û Yekîtiya Sovyetî** da nasîn, rawestandina **gihandina serbazan** (esker) di bikaranîna van çekan de xwest. Li gora wî, li **Amerîka 6000** serbazên gihandî hene. Di dawiyê de, wî ji **Komîsyona Ewropî** xwest ku **listeke navên maddeyên** "**précurseurs-clefs**", ku divê ku bikaranîna wan bê qedexe kirin, binivîse (ew navê şes ji wan dijimêre).

Piştî **W. Kuypers**, **enda-mek ji Têkoşer** li ser pîrsa Halabca, weka **pirseke kurdî ya taybetî** (xusûsi), angî ne di çarçeva şerrê Iraq û Iranê de, peyivî. Ew li ser du xalan rawestiya : 1) Ev nijadkujî **toleke** (intiqam) **hikûmeta Iraqê** ji gelê kurd ku ji destpêka vê sedsalê diji hovîtiya wî têkoşinê dide ye. Angî, ev **têkoşin ji şerrê Iraq û Iranê gelek kevntir e** û ji bo Iraqê pirr bitehliketir e, ji bo ku hêzên kurdî di van



Willy Kuypers

mehên dawîn de ewqas xurt bû bûn ku **nêzîkî birên petrolê bû bûn**. 2) Ev nijadkujî **ne nuh e**. Hem li Kurdistana Iraqê û hem li perçeyên din ên Kurdistanê, **ji zû de gelê kurd**, bi awakî sistematîk, û ji aliyê canî û çandî, **bi awayên cihê tê pelixandin û li nav birin** (imha kirin). Lê, mixabin, weşanên rojavayî li ser vê nijadkujiyê gelek agahdarî nadin û hikûmetên cihanê diji wê bi awakî vekirî rawestî, ji bo ku ji alîkî cihê gelek stratêjîk û dewle-

mend ê Kurdistanê menfeetên wan dixê tehlikê û ji alîkî din jî, ev her çar hikûmet nahêlin ku rojnamevan biçin Kurdistanê û reportajan li ser wê çêkin.

Li dawiyê, **Dr Heyndrickx** bi awakî gelek vekirî li ser tecrûba xwe peyivî : **Li hemî Ewropa, bitenê hikûmeta Beljîka destûr (izn) da ku mutexessîsek lingê xwe deyne Halabca** û nimûneyên tiştên gazkirî bi xwe re bine jî bo ku xebateke zanyarî (ilmî) ya serbest bike. Ev yek li Swêd, Bri-



Dr Aubin Heyndrickx

tanya Mezin, Fransa, Hol-
landa, Almanya Federal,
Otrîş ne mumkun e, ji bo ku
li van welatan, hikûmet rast
bi rast tedaxul dikin ku
çêkirina ankêtên weha nehê-
lin. Wi ONU di vi warî de bi
zexeliyê (hile, lîz) ittiham
kir. Wê ne hişt ku nûnerê
wê, Dominguez, biçe Ha-
labca ji bo ku wî nehêle ku
di rappara xwe ya ku ji aliyê
Konseya Emnîyetê hat pe-
jirandin (qebûl kirin) navê
welatê ku van çekan bi kar
anîn bêje! Li gora Professor
Heyndrickx, hertişt "poli-
tîze" bûye, "tu delegasyo-
neke resmî nikare navê dew-
leta ku gazên bijar bi kar
tîne bêje". Hikûmeta Iraqê,
hemî maddeyên bingehi
ku ji bo çêkirina van
çekên şimik pêwîst in ji
Rojavayê distîne "regezên
(unsur) çêkirina wan ku navê
wan Précurseurs-clefs ne
ji Beljîka û Swîs-
tên. Maskên gazê, cillên
xweparaztîne û hêlikop-
têr ji Amerika tên". Piştî

axaftinê, Dr Heyndrickx
diyapozîtîvên ku çûna wî
bo Halabca û serdana wî ya
nexweşxanan nişan dan
pêşan dan.

Piştî civînê, me dosya ku
me bi fransîzî nuh weşandiye
"Dossier Kurdistan" û
broşurên "Info-Blad
86-87" û "Bilan 86-87"
belav kirin rojnamevanan.
Televîzyona R.T.L. (Lu-
xemburg), her du radyoy-
ên beljîkî û rojnameyên
cihê, nemaze yê flamanî,
vê civîna giranbuha
weşandin.

21 Gulan : 8 saet ji bo Halabca

Kurdên bajarê Leuven
xebateke gelek hêja ji bo
nasandina Nijadkujîya
Halabca pêk ani. Ji katji-
mêr (saet) 14 heta 20, di
eywaneke xweşik a dibista-
na Sancta Maria Insti-

tuut de, raberîyeke (expo-
sition) wêneyên gelek
xemgîn ên gelheya Halab-
ca, sê filmên vidêo ku
belavbûna gazan û kus-
tîna wan ya xelkê bêsûc,
diyapozîtîvên ku assîs-
tanê Dr Heyndrickx nişan
dan, bala besdaran dîr û
dirêj kişandin û dilê wan bi
keser û nefreta hikûmeta
Iraqê tije kirin. Piştî axaftina
assîstanê Dr Heyndrickx,
rojnamevaneke De Mor-
gen bi awakî gelek xweş û
vekîrî hikîmetên ewropî û
rêxistinên navnetewî bi
bêdengi û lîztina lîzê
Iraqê ittiham kirin. Li ber
deriyê salonê, berpirsiyarên
vê rojê dosyeke li ser
Halabca belav kir, û li
hewşê xwarin û vexwarin
firotin. Hevalekî flaman
ku pêşkesiya bernamê dikir
Kurdên Leuven (Louvain)
ji bo vê xebata gelek hêja
pîroz kir û pêşneyar kir
ku ev raberî li bajarên
din ji çêbibe.

8 UREN STEUN AAN HALABJA

FILMS, DIA'S, DEBAT, INFOSTANDS
over de gifgas aanvallen op de Koerdische stad HALABJA

ZATERDAG 21 MEI VANAF 14 u.

CH. DEBERIOT STRAAT, LEUVEN
SANCTA MARIA - INSTITUUT

Ver Uitgever: MARK BOUSSAUW
Stationstraat 6, 3050 SINT-JORIS-WEERT tel: 016 / 47 15 58

VRU VAN ZEGEL.

Hevpeyvîn bi Prof. Heyndrickx re

Derwêş

Derwêş : Di rapor û gotarên te û di civîna çapê de, me li ser afirandin û bikaranîna çekên kîmyayî xwend û bihîst. Tîstê ku em dixwazin bizanin ev e : Dema ku tu çûyî Kurdistanê, te çi li navça bombekirî dît ?

Prof. Heyndrickx : Ez raste rê çûme Halabca. Li wira kesek ne mabû. Ne insan û ne heywan li nav bajêr mabûn. Yên mirî jixwe mirî bûn û yê birindar ji wira hatibûn rakirin, yê din ji wira revibûn. Bajarekî wêran, bêkes û bê jin bû.

Derwêş : Ango, te tu kesekî kurd li derdorê ne dît ?

Prof. Heyndrickx : Na. Paş ku em gihane nav bajêr, bi qasî deh merivên kurd hatin. Ew bi hespên xwe hatibûn ku hin ji firaxên xwe yê li pey wan mabûn bibin. Ew ji serê çîyan daketibûn. Ez bi wan re demeke pirr kurt axiftim. Ew, paş ku bajar hatibû bombekirin, gihabûn hêzên pêşmergan û xwe li ba wan parastibûn. Piştî, wan tevî hêza Kurdan li hemberî rejîma Saddam dest bi şer kiribû.

Ji ber ku Pasdarên Xumeynî li nav bajêr nobet digirt, me nikaribû zêde bi wan re mesgûl bibin. Jixwe van Pasdaran bi hebûna xwe

li Halabja û navçê, hemî karê me bi awakî muntazam nerihet dikir. Ew têkilî her karê me dibûn û dixwest ku her tîstê ku ew bêjin em bikin. Ew ji ne karekî rast e. **Karê ku em dikin bi awakî ilmi û insani dibe.** Em naxwazin ku ji bo propaganda dewletekê, weka Iranê, xebatê bikin û raporên li cihanê belav bikin.

Derwêş : Rewşa birindar û nexweşên ku te li nexweşxanên dîtin çawabû ?

Prof. Heyndrickx : Rezalet. Tîsteki pirr xerab. Dema ku min ew di wî hali de dîtin, min ji insaniyetê şerm kir. Cawa meriv dikare tîsteki weha bike, tê nagihjim.

Yên mirî jixwe çûn, lê yê birindar û sax li hemberî rejîma Saddam bûne wek agir. Gelê kurd jê nefret dike.


Derwêş : Rewşa tebiyetê û bajêr bixwe çawa bû ?

Prof. Heyndrickx : Li wê navçê tebiyetê ecêb xweş heye. Hê ji ew tebiyet delalbûna xwe diparêze. Lê cihê ku bombe lê ketine wêran bûye. Bajar jixwe bicarekê xerab bûye. Bi tesîra bomban ew bûye goristaneke hemî bin û pixar. **Dilê meriv ji wê yekê dipe-rite.** Gel nema ye. Insan

nema ne. Bitenê leşkerê iranî li serê kuçan xuya ye. Ew ji ji alîkî din ve pirr gumanan çêdikin. Ji alîkî ve ew bixwe bombên kîmyayî çêdikin û bikar tinin û ji aliyê din li Halabja vê qetliamê ji xwe re dikin propaganda.

Derwêş : Tesîra van bombên kîmyayî çend salan dom dike ?

Prof. Heyndrickx : Ji 10 ta 20 salan dom dike. Paş re tesîra wê hunda dibe. Cihê bombê bixwe heta 20 salan dom dike. Lê yê derdor 10-15 salan dom dikin. Em vê yekê ji diroka xwe dizanin. **Di serê yekemîn yê cihanê de, yekemîn car bombên kîmyayî li Vlanderen hatin bikaranîn (li leper "Ypres").** Gelê me ji bi wan bomban hate bombe kirin. Gelê Kurd ji yek ji wan gelên ku bi vî awayî tê qurban kirin. Bi





awaki ne insanî bi hezaran kes tîn kuştin.

Derwêş : Li Kurdistanê, te hin cihên din jî, ku berî Halabja, di wê demê de û paş re hatibûn bombekirin, dîtî ?

Prof. Heyndrickx : Belê. Em bi helikopterê li ser navçê geriyan. Gelek gund û bajar hatibûn bombekirin û wêran bûbûn. Ez dikarim ji te re sê bajaran nîşe bikim : **Dojmeh : 15.000 kes, Xormal : 25.000, Eanab, 15.000,** bi yek carê bûbûn çol. Te ne insan, ne lawir û ne darek sin didit. Ew jî berê Halabjê hatibûn bombekirin. Sê bajar bûbûn sê goristan, sê wêrangeh.

Derwêş : Ango, tu dibêji ku Iraq, rejîma Saddam, van çekan berê Halabja û paş Halabja jî wan bikar tîne ?

Prof. Heyndrickx : Belê.

Nuha jî ew van çekan çê dike û bikar tîne. **Bombe û çekên kimyayî çekên atomik yê dewletên feqîr in.**

Iraq jî û Iran jî van çek û bomban çê dikin. Wan bi kar tinin. Di vê keliyê de jî, ew gelê kurd dikujin. Ev jî bêbextiyeke mezin e. Berî çend rojan, Iraq dîse hin bajarên Kurda bi van çekan bombe kirine. Lê ne bitenê ev her du dewlet van bombe û çekan çê dikin. **Kuba jî wan çê dike û li hemberî Savimbi-Unita bikar tîne. Vîyetnam li hemberî Kamboçya, Rûsya li hemberî Afxanan wan bi kar anin.** Ev dewletên otorîter jî hergav gelên bê hêz, bê deng, bê çek û belengaz jî xwe re qurban digrin. Bi vê yekê **çekên xwe hem jî bo şer bikar tînin, hem jî wan tecrube dikin.**

Derwêş : Meriv çi dikare



bike ku ji tesîra van çekan derkeve ?

Prof. Heyndrickx : Pir zahmet e. Tek çare ev e ku ev çek li cihanê qedexe bibin. Ew jî bi yek rê dibê : **qedexekirina çekirina dermanê van çekan.** Dema ku ew derman hew bê çê kirin, çek jî tûkes nikare çêke.

Min çend caran rapor li ser vê yekê pêsneyari Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (O.N.U.) kir, lê heta nuha tu bersiv nîne. Min rapora xwe ya li ser Kurdistanê Başûr (Iraq) jî ji vê rêxistinê, li New York û Cenev, re û ji Rêxistina Xaçê Sor re, rêkir û bersiv xwest. Lê mixabe, ji her deri xwe ker dikin. Ango, ev rewş pirseke giran û navnetewî ye.

Derwêş : Spas.

Dîroka Kurdistanê di

- XIII -

IV - Civaka kurdî (4)

C - Adet û pêmahiyên civakî (2)

3- Cêjn û dem

Ji gelek cêjnên ku di deman (mewsîm) de jina gelê kurd nîşan dîkin, cêjnên olî yê Islami li herder tîrî pîroz kirin, ango dibe ku ji derveyî mawlud yan cêjna çêbûna pêxember Muhammed, ne pêwîst e ku meriv li ser wan bi awakî taybetî (xusûsî) raweste. Bi rastî, dibe ku tiyê Selaheddin, Muzaffer El-Din Kôkbûrî, waliyê Erbilê, royê (esl) vê cêjna ku wî bi gelek mezinayî û şahî di 604/1207 de pîroz kir be. Bûyera wê ji aliyê Ibn Xalîkan (681/1282) ku li Erbilê çêbû bû hat gotin, û ji aliyê J. Sauvaget, *Historiens arabes*, Paris 1946, 118-25, bo fransîzî hat wergerandin. Bi hinceta (munasebet) vê cêjnê, pesna wê, ku gelek nîseyên wê bi kurdî hene, tê xwendin. Em bitenê *Mewludname Melle Ehmedê Batê (1425-1495?)*, ku li Qahirê di 1905 de, û ji nuh de li Stembolê di 1919 de hat weşandin û ku hin ji tê bi kar anîn, bêjin; *Bîyîşa Pêxember*, Sam, di Kitêbxana Hawarê de, IV (1933); *Sêx Muh. Xal, Mewlûdnameî new eser, Silêmanî 1937*; nivîskar bixwe, *Mewlûdname, di Kurdistan (Tehran), N° 166 de; Melle Hasan Hartûşî, Mewlûdname, berhem bixwe, N° 43-134 (1960-2)*.

Cêjneke pîr geleri li ba Kurdan û ku pasê li Iraqê, ji dema sazûna Komarê (1958) fermî (resmî) bû, *Newroz*, yan *Cêjna Sersalê*, ango ya biharê (21 Gulan) e. Ev cêjna netewî ya Kurdan e. Jixwe ew

her gav ji aliyê Yezidiyên ku weka parêzkerên pêmahiyên kevn tîrî dîtin hatiye pîroz kirin û ew navê wê dîkin *Serisal* (li Lescot, berhema buhurî, 71 binêre). Ev cêjn ji berê *Islamê ye "efsana bihara ebedî"*, ku her gav di cihana îranî de dihat pîroz kirin (li G. Widengren, *Les religions de l'Iran*, Paris 1968, 58-67 binêre). Tê gotin ku ew ji aliyê qralê efsanî Cemsîd hatiye saz kirin (H. Massé, *Croyances et coutumes persanes*, Paris 1938, 145). Iro di cêjna fermî de axaftin, helbest, dilan û şanoyên ku tê de efsana têkosîna Kawayê hesinker diji Dehakê canewer, yan Azî Dahaka, ku têkosîna gelê kurd ji bo serxwebûna xwe nîşan dide, tîrî pîsan dan. Li Silêmaniyê, di vê cêjnê de her celeb şahî û henekên ku mirekî derewîn nîşan didin çêdibin; ew karnavaleke rast e (Edmonds, 84-5; Tewfiq Wehbi, *The*




(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981, Wergerandin, fransîzî-kurdî : Pervin.-

Ansîklopêdiya Islamê de (٢)

Rock Sculptures of Gunduk Caves, di Sumer, IV/2, 1948, wergerandina fransîzî di BECK, VII, 1949, I, 13 de). Ereba Sema awakî din ê karnavali dibêje : Kose geldî, Berbang, di Berêvok, Erivan 1969, 61-2 de. Di vê cêjnê de, siraniyeke taybetî "samani pazan" ku, bi şev, Ayşe yan Fatîma ewê, bi danîna destê xwe li ser wê, bereketê bidin wê, tê çêkirin. Meriv wê tevî malbat û hevalan dixwe ji bo ku zarokên meriv çêbibin (Wehbi, 11-12). Li Iranê, berê Sersalê bi rojekê, merasîmên sihîrbaziyê tevî şahîyan dibin (M. Mokri, Les rites magiques dans les fêtes du Dernier Mercredi de l'Année en Iran, di Mélanges Massé, Tehran 1963, 15 de). Wê rojê, keçên cuhan daxwazîyan dikin : Sêzdeh lî ber derî ye, Sala nuh e ! Mêr li malê ye, zarok li himêzê ye ! (Massé, berhema buhurî, 159). Li derve, xwendekarên kurd vê cêjna netewî di şahîyeke mezin de pîroz dikin (Deichi Delair, Newroz and the legend of Kawa, di The Kurdish Journal, U.S.A; 11/1, Adar 1965, 3-5 de). Em di Kurdistan, London, organa K.S.S.E. N° 7/8, 1961 de jî helbesta The festival of Newroz a Salih Karadaxî, 32 bêjin.

Cêjnên din ên demî jî tîn pîroz kirin, nemaze jî aliyê şivanan, bi hinceta tiştê ku bi awakî taybetî bala wan dikişîne : Cêbûna berxikan (serapez), çûna zozan yan çêrgehî (berodan), kurkirina miyan (berxbir) û nemaze berdana beranan (beran berdan). Ereba Sema, berhem bixwe, 58, van şahîyan bi gelek hûriyên (tefsîlat) rengîn û geş wafî kir. Stig Wikander bawer kir ku wî di vê cêjna dawîn de bireweriyên efsanên kevn ditin (Ein Fest bei der Kurden und im Avesta, di Orientalia Suecana, IX, 1960, Uppsala 1961, 7-10 de). Gundî jî pêmahiyên wan hene. Di dema paleyiyê de, gîrsa yekemîn a ku bi dasê tê çînin jî biyaniyê yekemîn ê ku derbas dibe




re tê pêşkeş kirin (Hamilton, berhema buhurî, 51), û çîniya tûyan dibe hinceta cêjneke bi govendeke taybetî (gîzîdan), ango "sivnikkirin", ku bi sivnikkirina erdê bin daran, berê ku zarok hilkişin wan û wan dawêşînin, ku jin karibin tûyan berhev bikin, dibe (Edmonds, 170, N° 1).

Eger em li vê derê ne li ser cêjneke rast dipeyivin jî, em hîn kirinên hinek xurafî ku girêdayî deman in û ku rayê wan bê gûman hildikişin çaxên kevnartirîn nîşan didin. Eger bitenê çend xebatên kêmtir jî bo rawestandina baranê bîr nasandin (li Nikitine, Une apologie kurde, 16 binêre), di vajayê wê de, T. Wehbi, berhem bixwe, 7-9, jî neh merasîmên hinek ecêb û bê gûman bifeyde, jî bo têkoşîna dijî zuhayiyê û jî bo anîna baranê, kêmtir najimêre. Eger limêj (noja berana) têr neke, derwişek di nav hawuzekê de tê avêtin yan jî jin xwe girêdidin cotekê û çem

cot dîkin. Hin tevgerên din ên weha ecêb ji tîn kirin ji bo ku daxwazyên meriv bi cih bîn (li S. Reinach, *Charme pour obtenir la pluie "di Kurdistan de"*, di *Anthologie*, XVII, 1906, 633 de).

4- Dîlan û muzîk


Kurd hergav û li herder distirê. Hemi cêjnên malbatî : çêbûn, sunnet û nemaze dawet bi hogîriya govend û stranên dîbîn. Ev yek di cîvînên êl yan gundiyan de û di hin merasimên olî de ji dibe. Navê dîlanan li gora navçe yan êla ku ew tê de tîn kirin dibe. Nîşe : Botanî, serhedî, şêxanî, yan ji li gora



awayên ku wan cihê dîkin, weka : Sêgavî, gîranî, royne yan govend û çopî. Xwendekar dîlaneke wan a taybetî "bêlîte" yan "bêlûte", ku Tawûzparêz jê ji me re çend nîşeyan dan û ku ahenga wan waf dîke heye (La vie universitaire au Kurdistan, di *Hawar*, N° 35, 15 Adar 1943 de). Rêwiyên kevn yan nuhtir ji taybetiyên van dîlanan kurdî re heyran man (nîşe : F. Millingen, *Wild Life*, 378-9, yan Edmonds, *Kurds*, 84; Drower, *Peacock Angel*, 130-34; Th. Bois, *Connaissance*, 61-2, navê nêzîkî bîst dîlanan dijimêre. Em bala

we bikîşînin ku dîlanan geleri tevlihev in (Jîn û mêr), û ev taybetî Kurdan ji gelên din ên misilman ên hawsê (ciran) cihê dîke.

Muzîka kurdî, ku ji dîlan û stranên venaqete, beşek ji muzîka ku navê wê muzîka rojhilatî tê kirin e, lê meriv nikare wê ne tev li muzîka erebî, ne ermenî yan tirkî bike, li gel ku wê carna li ser stranên welatên hawsê, weka Iran û Mêzopotamya, kar tê kirîye (tesir kirîye) (li S. Jargy, *chant populaire et musique savante au Proche Orient arabe*, di *Orient*, VI/2, 1958, 108-9 de, binêre). Muzîka kurdî iro qet ne zanyarî (ilmî), lê geleri ye, û ew ne "harmonie" (zanîstiya sazûn û hevgyrtina notan) û ne "polyphonie" (hunera nivîsîna muzîkî, bi perçeyên cihê) nas dîke. Ahengên wê yên pîr û cihê, taybetiyêke wan a giran, ku hestên (hiss) xurt şîyar dîke û ku pîrîcar xemgîn e, heye. Ev yek li ba vî gelê şerker meriv şaş dîke (li Dulaurier, *Chants populaires de l'Arménie*, di *Rev. des deux mondes*, 10 Nîsan 1852, 224-55 de, binêre). Rêwiyên rojavayî di nîşandana taybetiya vê muzîkê de di paş de ne man; hinên din, di vajayê wê de, weka Stî Hansen, 128-9, vê muzîkê û 17 dengên wê "bêtam û çewt" dîtî. Kesseyê ermenî, Vartabed Comitas (1869-1935), ê yekemîn bû ku hin stranên geleri yên kurdî berhev kirin û nivîsîn (*Quelques spécimens de mélodies kurdes*, di *Recueil d'Emine*, Moskov 1904, weşana duyemîn li Erivanê, 1959 de). Jixwe li Erivanê Dîbistana Muzîkê Malikyan cuhanên kurd ku li ba dengbêjên kevn stranên tradîsyonêl qeyd dîkin digihîne. Bi vî awayî, Nûra Cewarî 33 Stranên dîlanan kurdî ku li Tiflisê, di 1960 de, berhev kirin nivîsîn. Cemîla Celîl ji du berhevokên notan yên stranên geleri yên kurdî weşandî. A yekemîn, li Erivanê (1964), metnê kurdî û nota muzîkê ya 75 perçeyan dîde; a duyemîn, li Moskovê di 1965 de, ji derveyî metnê kurdî, nota muzîkî û wergerandina rûsî ya 100 stranên cihê dîde. Li Iraqê, ji 1958, seriketeke muzîka kurdî xwe pêk anî ji bo parastin, standard kirin û pêşvebirina muzîka kurdî (li B. A. Ali, *An Approach to*



kurdish music, di Kurdistan, K.S.S.E., I, Adar 1958, 3-6 de; S. S. Gavan, *Divided Nation*, London 1958, 15). Lê Ewropî ji bala xwe didin muzika kurdi (li D. Christensen, *Tanzlieder des Hakkari-Kurden*, Eine material kritische studie, di *Jahrbuch für musikalische Volks- und Völker-Kunde*, Berlin, I, 1963, 11-47 binêre). Ev lêgerîneke gelek ciddî li ser muzika dilanê, ya destgehi (bialet) û dengî, li Hekari, ye. Ew tê de ahengan tehlil dike û bi awaki zanyarî li stil û ritmên wan hûr dinêre (Edith Gerson-Kiwi, *The Music of Kurdistan Jews. A synopsis of the Jewish music research Centre*, cild II, Quds 1971).

Ola Islami tucar muzikê di merasimên olî de napejirîne. Loma, muzik di merasimên tariqetên cihê de, ku dibe ku bikaranîna wê bi sazûna van rêxistinên dest pê kir, pena dibe (iltica dike) (li J. S. Trimmingham, *berhem bixwe*, 195, 196 û wekî din..; M. Mokri, *Le Soufisme et la musique*, di *Encycl. de la Musique*, Paris 1961, 1014-15 de binêre). Ji bo vê yekê, muzik, bê pirs (problêm), ket nav mezhebên ecêb ên Yezidiyan, nav kortêjên olî û civinên "sama" (stranên olî ku merivek tenê bi destgeheke tenê distirê "bi fransîzi

: récital") yên wan. Sê stranên olî yên Yezidiyan, hin ji aliyê H. Layard, *Niniveh und Babylon*, 1853, N° 667-9, rûpel 507, hati bûn nivîsîn. U E.S. Drower (berhema buhurî, 118-9), ritmê daholan di merasimekê de qeyd kir. Eger em werin Ehlê Heq, Muh. Mokri li ser adetên wan ên muzikî, di gotara xwe *La Musique sacrée des Kurdes "Fidèles de Vérité" en Iran*, di *Encyclopédie des musiques sacrées*, Paris 1968, 444-55 de, me ronî dike.

Destgehên muzikê li ba Kurdan pir car bi hunera destî tên çêkirin. En ku bêtirîn tên bi kar anîn destgehên bayî ne, weka bilûr ku her şivan dixê nav tûrika xwe, zurne ku di hemî dilanan de cihê xwe distîne û duzale ku weka bilûreke bi du boriyên ji şiv yan hestiyê çivikan e û ku dengê wê weka yê "cornemuse" a skotlandî ye. Destgehên lîxistinê : Dahol, tepil, xelile ku du perçeyên gilover ên hesinî ne û ku carna ji aliyê Yezidiyan, di merasimên wan ên olî de, tên bi kar anîn. Ji destgehên bi ben, em ribab, keman û nemaze tenbûr dibînin. Peynasya hemî van destgehan li gora navçeyan diguhere. Wafî û wêneyên ne baş ên destgehên muzikê yên cihê di "Serincik le derwaze-i Folklor-i Kurdiwe, Hewlêr/Erbil, 36-7" de hene.

5- Lîz, spor, nêçîr

Bi hinceta cêjnên demi û yên din, rêwî li ba Kurdan hin lîz û sporên geleri ku hin ji tên kirin dîtî. Em nikarin wan hemîyan bêjin. Ji lîzên hundirê malê, ji yên dûbaretirin (bêtirîn) a kaxîzan (îskambîl) e, nemaze li ba bajariyan, nêrd û nemaze setrenc ku lîzeke gelek resen (esil) e. Ji lîzên ku li derve tên lîztin, cerid ku bezandana hespan e, lîzên topê (çowgan) û gelek lîzên bazdan û avêtinê, ji derveyî sporên nûjen, weka fûtbol û baskê û lîzên zarokan. Em serrên beran, gayên mezin yan kewan ji binî bira xwe. Meriv gelek zanînan li ser vê babetê di van berhemên de dibîne : Tawûzparêz, *Les Jeux kurdes*, di Hawar, 42 (15 Nisan 1942), 654-6 de; Kurdi we Mêriwanî, *Kitab-i Yari*, Bexda 1932, 32; M. Mokri, *Baziha-ye Kordi : Xurmayla*, di Yaxima, sala

duyemin, Tehran, 1331 p./1951 de; Baziha-ye Kordestan, di Tamaddon, rêza 2min, 7, 317-20, Tehran 1332/1952 de. Di Kurdish Dialect Studies, I, Oxford, 1961 de; D. N. Mackenzie navê hin lizên kurdi, di rûpel 147, 218 de, dide; Th. Bois, La vie sociale, 32-3/628-9 û notên 136-41.

Pirbûna lawirên (heywan) nêçirê li Kurdistanê, yên bi mû û yên bi pirç, ku me li jor gotin, sedema hezkirina mezin a Kurdan ji nêçirê ye. Ji bo ku meriv têbigihêje vê spora netewî, çetirên tist ew e ku gotarên Osman Sabri ku ew tê de mêtodên nêçirê bi hunera nêçirvaneki bitecrube pêşan dide bixwine : Nêçir, di Ronahî, 17 (1 Tebax 1943), 317-23, 18 (1 Ilon 1943), 347-50 de. Hirç bi sê awayan tê nêçir kirin (317), keftar (317), pezkovî (318), rovi (319) û kêvroşk "kiroşk" (319). Pênc awayên nêçira kew hene : Nêçira çatiyê (bi alikariya du kewan), nêçira mariyê (mêkew), bi tifting yan bi tor, li gora ku meriv bixwaze pê sax bigire yan wê bikuje (320). U meriv dikare nêçirê bi alikariya teyres, hulilk yan sê celebên teyrê bazi : Şahin, sipir û doxan ku buhayê wan bilind e, bike (321-2). U ew awayê ku ev teyrên xwedi kirin û daxistin nişan dide (347-8). O. Sabri gelek ji nêçira kêvroşkan, bi alikariya tajiyên ku celebên wan pirr in (348-9), hez dike. Niviskar nêçira masiyan (319) ji bir nake, eger bi tor, bi çengel yan bi metran (celebeke tir) be. Hamilton pis-keke (fasl) bixwe ji bo nêçira pezkovî ya gelek rengin û dijarar vediqetine (berhema buhurî, 165-73). U meriv wênayên fiz-fizk, feq, benik û torên cihê ku ji bo hin nêçiran tên bi kar anin di "Serincik, berhema buhurî, 99-102" de dibîne.

CAVKANI

Civakzani, ethnografi : B. Nikitine, *Quelques observations sur les Kurdes di Mercure de France*, CLV (1921), 662-74 de; *niviskar bixwe, Les walls d'Ardelan, di RMM*, XLIX (1922), 70-104 de; *niviskar bixwe, La vie domestique kurde, di Rev. d'Ethnologie et Traditions populaires*, 1923, 334-44 de; *niviskar bixwe, La féodalité kurde, di RMM*, LX (1925), 1-20 de; K. Daghestani, *La famille musulmane contem-*

Les Tribus montagnardes de l'Asie Antérieure. Quelques aspects sociaux des populations kurdes et assyriennes, di BEQ, VI (1936), 1-50 + VI Pl. de; A. El-Azzawi, *Asair El-Iraq*, 2 cild, Bexda 1937-43; E. R. Leach, *Social and economic organisation of the Rowanduz Kurds*, London 1940; E. Evdal, *La femme kurde, bi ermeni*, Erivan 1946; *niviskar bixwe, Çi biçay krowno mesî u Kurday Zakawkaz'ya (Adet û heyfstandin li ba Kurdên Pas-Deqasvê)*, Erivan 1953; Fr. Barth, *Principles of Social Organisation in Southern Kurdistan, di Univ. ethnogr. Mus. Bull.*, 7, Oslo 1953; W. L. E., *Iraqi Kurdistan, a littleknown region, di The World to-day*, Ciri 1956, 417-32; C. J. Edmunds, *The Kurds of Iraq, di MEJ*, XI (Zivistana 1957), 52-62; B. Nikitine, *L'état social des Kurdes et du Kurdistan, d'après les publications russes récentes, di l'Afrique et l'Asie*, XLV/2 (1959), 49-55 de; L. N. Kotlov, *Le soulèvement de libération nationale de 1920 en Iraq*, O. L. Viitchevsky, *Les Kurdes Moukri*; T. F. Aristova, *Aperçu de la culture et du mode de vie des paysans kurdes de l'Iran*; U li A. N. El-Saadi, *The Kurds in Iran, di Kurdistan, K'SSE*, IV (Nisan 1959), 11-14 ji binêre; B. Nikitine, *La structure sociale des Kurdes de Transcaucasie, di l'Afrique et l'Asie*, XLIX/1 (1960), (i.e., Evdal, *Mode de vie des Kurdes de Transcaucasie*) de; S. Xasbak, *El-Kurd wel-mes'ala El-Kurdiya Bexda*; N. Erdentung, *A study on the social structure of a Turkish village*, Ankara 1959; Dina Feitelson, *Aspects of the Social Life of Kurdish Jews*.



di *The Jewish Journal of Sociology*, published on behalf of the World Jewish Congress by William Heinemann Ltd, 1/2 (Kanûn 1959), 201-16; H. H. Hansen, *Daughters of Allah among Moslem women in Kurdistan*, London 1960; *nivâskar bixwe*, *The Kurdish Women's Life. Field Research in a Muslim Society, Iraq*, Copenhagen 1961; Barho Karabuda, *Lister am Eufrat, i Kurdensland*, Stockholm 1960; M. Makri, *Le foyer kurde*, di *L'Ethnographie*, 1961, 79-95 de; Th. Bois, *La vie sociale des Kurdes*, di *Mactria*, LVI (1962), 599-661 de; P. Gache, *Les Kurdes*, di *Rev. de*

Psychol. des Peuples 1962/1, 23-57, 2, 191-220 de; Mahmud Bayazidi, *Nawî i abîkai Kurdan, Adat u-rusumatnâme-e Akra-diya, wergerandina rûsi û metnê kurdi yêr Stî Rudenka, Maskov 1963*; T. F. Aristova, *Kurdi Zakavkaz'ya, Maskov 1966*; H. Akrawi, *Fondements psychologiques et sociologiques des tribus kurdes Kerkûk*, 1971. (TH. BOIS)

Dûmahî heye


N ê ç î r

Osman Sebrî

Li welatê Kurdistanê nêçîr û nêçîrvanî tiştekî welê ye ko her Kurd pê dizane. Cawan kurd bi cengçûyî û serkerî hatine nasîn, welê jî bi nêçîrvaniya xwe dilges in. Li Kurdistanê nêçîr û nêçîrvanî li goreyî cih û esiran tê guhartin. Nêçîra ko ez dixwazim çêlî wê bikim, herçiya li nav esîra me Mirdês pê emel dikin û dizanin e. Heye ko li cihine din awane nêçîrê ên din jî hebin ko min ne diti be û ne jî bihisti be; lê herçiya dinvisim, nêçîra ko min ditiye û tiştekî jê dizanim. Li nik me di navbera rawîr, dîrende û firende da heft texlît nêçîr hene ko hinekê wan bi çend çîştan dibin.

Nêçîra hirçan

Nêçîra van celeb dîrendeyan bi sê çîştan dibe. Çîştê pêşîn kê nêçîrvan dikarin pê rabin ko jê ra dilekî xurt dixwaze. Nêçîrvanê vê nêçîrê, jî bo destê xwe ê çepê **lepîkeke kulavî** pir zexim tevi **sîngeki hesinî** i duserî û dunukul dide çêkirin. **Xençera** xwe bi werisekî va jî dibe û tevi hevalekî diçe ser devê **kunhirçê**. Serikî



Dawî vewestîm wa bîm kalemêr
Zîndan jî bo min wek rîkêha şêr.

Zindana Samê, 7.3.1972

(Apo, Hemrêş Reşo)

werîs li pişt a xwe girêdide û serê din dide dest hevalê xwe û dibêje: heke heya niv saetê ez ne hatim cendekê min bikîşîne.

Pîştî vê gotina han xwe berdide kunhîrçê. Kunhîrç gelekî kûr û daketina wê e dijiwar e. Nêçîrvan, hêdî hêdî pêda diçe; dema digehe dawiyê, borin bi hîrçê dikeve û dirêji nêçîrvan dike. Gava hîrç xwe digehinê, nêçîrvan destê çepê ko lepikîrî û singhesin tê da derbasî devê hîrçê dike. Hîrç bê dîlovani destê ko ketê dêv gez dike. Di wê gezkirinê da ye ko xwelî bi hîrçê dibe. Her du seriyên sing ên dunukul di çen û ezmanê devê wê da cit dibin. Ji ber ko her du seriyên sing e dunukul in nema bi dertên. Nêçîrvan, piştî ko bi vî awayî xwe ji devê hîrçê diparêze; bê ko kêşê bide destên wê, bi destê rastê xençera xwe di ser û binê parxanan da bi lez çend caran dadişikîne. Heke nêçîrvan î xençerhingêv be, bi du xençeran perda dil diçirine û davêje erdê. Ji xwe gava birîna hîrçê ne ji dil be, bi sed xençerî ji namire. Dema hîrç dikeve, nêçîrvan werîsê bi pişt a xwe va vedike û pê lingê hîrçê girêdide û welê dikîşîne derê kunê. Di vî awayê nêçîrê da li nav Mirdês Mehmedê Silêman axa î jêhatî bû.

Cîşîtê dudûyan: Vî awayê nêçîrê, nêçîrvan didevaniya kunhîrçê dîkin. Ci gava şopa lingên hîrçê an tersê wê ê nuh li dora kunê ditin, **sê-çar nêçîrvan** tev tîn û di darhêla devê kunê da xwe vedîşêrin. Piştî roava ko tariyê erd hilçîni; ji bo çêreyê hîrç bi derdikeve. Gava ji derê kunê bi derket, hemî bi hev ra **tîfingên xwe** pê da vala dîkin. Heke

birin ne xedar bin hîrç direve û difilite.


Cîşîtê sîsiyan: Ev awayê nêçîrê di mehên **gulan û hezîranê** da dibe. Piştî ko berf li çiyê radibe û **giyanermik** di kortan da hisin dibe, hîrç piştî roava û berî birbangê, du danan ji wî giyanermikî diçêre. Ji bo ko nêçîrvan bikarin bin derba xwe bihingêvin, **di hîvero-nan da** diçin vê nêçîrê. Nêçîrvanên jêhatî pir caran ji vê nêçîrê destvala venagerin.

Nêçîra keftaran

Heke keftar ji birê

direndan be ji, li cem me bi wî çavî lê nanihêrin. Ev rawirê leşxwer bi qasî ko ji direndan bête jimartin ne î jêhatî ye. Bi tenê xelkê Sûriyê ew ji xistîne nava direndan û zarokên xwe pê dîkin xew. Heke min va benda han li welatê Kurdan binivisîna, teqez min dê ew ji birê rovî û çeqelan bihesibandana. Lê ji ber ko iro di Sûriyê da rûdînim, divê hinekî hurmeta şûra xelkê cih bikim. Ji bo xatîrê vî xelkî bila keftar ji dirende be.

Nêçîra keftaran, li hemî hêlên Kurdistanê bi **awakî ye**. Ew ji ê ko temayîya kaviîlê keftêr dike, **kêr û benê xwe** digire, bê ko



Nêçîrvanên keftaran

hesaban jê bike dikeve kuna wi. Dema keftar nêçîrvên dibîne, ji tirsan diranên xwe li hev dixîne û segeşeq jê tê. Hînga nêçîrvan jê ra **lawikan dibêje** û heke def pê ra hebe li **defê ji dide**. Li ber dengbêjiya nêçîrvên, keftar weke keran guhan bi xwe da digire û tîne nava gund. Piştî ko serêki raveyî xelkê dike, **kevirêki li sêrî dide** û dikeve.


Carekê min yek ji keftarên girtî diti bû. Bêtirî ko kovitî nîşan bidanan, şermok xweya bû. Heke ez bêjim, rûmeta rovîki di serçavên wî da tîne bû, teqez min zilim lê ne kiriye. Nêçîra keftaran karê **gewendan** e. Heke bê gewendan jî hinekên din hebin, teqez ew jî ji gewendan ne dûr in. Min dil hebû çendekan ji lawikên ko nêçîrvan ji keftêr ra dibêjin binivisim. Lê pasê hate bîra min ko sazband di pişt keftaran rabin û bêjin: keftar ne direndeyekî ewçend i tirsok e; lê ji ber ko mîla saz pê ra pir e, ji xwe diçe û nema dibîne ko eskên wî tîne qelastin.

Nêçîra koviyan

Nêçîra van celeb rawiran bi **du çîştan** dibe. Yek, çend nêçîrvanên jêhatî diçin **gomên wan** û di goman da dikujin. Gomên **pezkoviyan**, her gav di eniyên zinarên mezin û asê da dibe ko ne rê û ne jî xaçerê, pê nakevin. Ji xwe kovî di çûyîna rûyê zinaran da gelekî jêhatî ne. Dema nêçîrvan diçin diyarê zinarê ko gom tê da, nêçîrvanê şanpaz di rûyê zinêr ra dadikeve gomê û koviyên tê da direvine. Hînga ên li diyêr tîfîngên xwe pê da vala dikin. Ji ber ko kovî gelekî

sivik in û zû li ber çavên nêçîrvanên wenda dibin, nêçîrvanê pir ê sivik û bi desthilanîn, jî du berikan zêdetir nikare bavêjê. Hin caran, nêçîrvanê ko di eniya zinêr ra xwe berdide goma koviyên bi xweşî li hevalan venagere. An lingê wî dişemite, an jî di nivê rê da kovî xwe lê diqelibînin û di bilindiya 800-1000 gazi da dikeve xarê ko perçê wî ê mezin guh dimîne.

Çîştê didûyan, gava **berfa kepek** dibare, nêçîrvan bi çiyê dikevin û **sopê**



digerînin. Gava bi ser rêçên wan va bûn, li pê diçin heya dibînin. Hînga nêçîrvan û jêhatîbûna xwe; yekî, **dudûyan**, **sisiyan** jî dikarin bikujin. **Gostê kovîyan** payizê, berî ko nêrî diçe nav kerîyan xweş tê xwarin. Ji ber ko di vê demê da gelekî qelew dibin.

Nêçîra roviyan

Nêçîra van celeb rawiran bi tenê jî bo kaviên wan têtê kirin ko du awa ne. Yek, di dora gundan da **faq** lê tê venandin ko vê nêçîrê gewende û dûman dîkin. Awayê **dudûyan**, bi **seyên nêçîrê û tajiyan têne girtin** ko min jî ev nêçîr kiriye.

Nêçîra kêvroşkan


Ev nêçîr bi **çar çîştan** dibe. E **pêşin bi tajiyan** ko awayê kirina vê nêçîrê ji her kesî ra nas e û ne hewceyî salixdanê ye.


Ji vê nêçîrê ra, ji agahiya segman pirtir xurtiya tajiyan divê. Min pênc salan ev nêçîr kiriye.

E **dudûyan**, li **erdê** dibe ko her nêçîrvanek bi kêrî vi awayê nêçîrê nayê. Ev celeb nêçîrvan gelekî bi bînayî ne û li erdê dibînin. Gava nêçîrvan **kêvroşk** li erdê dît, hêdi hêdi di dorê ra doş dibe, heya nizingiyê lê dike. Dema nizingî lê kir, bê rawestî tîfîngê berdidê.

E **sisiyan**, **piştî rakirina bândaran**, **kêvroşk** bi şev tîne û li ser bândaran hewên di nav kêş û efarê da hildîçînin. Nêçîrvanê vê nêçîrê bi roj diçin ser bândarê û **kozika xwe** çêdikin; bi **roava** ra **tê** da rûdînin. Gava bi şev **kêvroşk** tê ser bândarê bi tîfîngê lêdidin.

E **çaran**, **qemelax** e ko di **berf barînan** da ev celeb nêçîr dibe. Dema du sê bost berf dibare, berî ko berf xwe bigire û hîşk bibe, çend





nêçirvan tev da diçin. Ci kêvroşkên ji pêş wan rabin nafilitin. Ji ber ko lingên kêvroşk kin in û heya bin zik bi berfê da terin xar. Heke bi holbûnê bi qasi du sê sed gaz bireve ji, zû diweste û tête girtin.

Lê cihên mayî, anê li destan di hin cihnan da bi **teyran** ji nêçira kêvroşkan dikin. Lê di vê nêçirê da, ev celeb teyr bi serê xwe nikarin kêvroşk bigirin; bi tenê **arikariya tajiyan dikin**. Ev arikariya han ew e ko gava kêvroşk radibe, nêçirvan teyr û tajiyan bi hev ra berdidin. Bê şik teyr berî tajiyan xwe digehinê. Di dema gihêştinê da, ji ber ko nikare bigire an rake, perên xwe li çavên kêvroşk diêxe û ji tirsan kêvroşk li ser piştê xwe davêje erdê û taji digehênê.

Ciqas ko teyrên xurt, ên ko kêvroşkan û hin ji wan mezintir rakin ji hene; lê ev celeb teyr bi kêrî nêçirvanan nayên. Ji hêlekê, ewçend e mezin in ko ranabine ser destan; ji hêla din, ewqas e kovi ne ko kedi nabin. Di nava teyran da i xurtir û dirende ev in. Ji van, li welatê me, **teyrêres û dûbirang** hene. Hinek ji Kurdan bi teyrêres ra **terlan** ji dibêjin. Ji ber xuzexmiyê,

Kurd wi padîşahê rti û zexmiyê, Kurd wi padîşahê teyran dizanin.

Nêçira masiyan

Nêçira masiyan li nik **Kurdên berav** pir çîşit in. Lê herçiyên ko li cem me pê dixebitin **çar in**. E **yekê**, **tor e** ko ev awayê han ji hemî kesan ra nas e. Ji lewra di wî warî da peyivîne ez zêde dibinim.

E **dudiyan, çengel e** ko ev celeb nêçir karê zarok û biçûkên ko newêrin xwe bidin nav avê.

E **sisiyan, bi destan girtine** ko ev celeb nêçir li nik **berçemiyên** gelekî bi rewac e. Vê nêçira han xortên şampaz dikin. Di rojên **havin û paizê** da birek xort digehên hev û diçin ber çêm. Kijan cihê ko fireh û kûrayî hindik e di wir da xwe berdidine çêm. Ev masivanên han, her yek kira-seki an derpeyekî li ser xwe dihêlin û di rex hev ra bi nava çêm da dimeşin. Herçi masiyên heyî li ber wan direvin û xwe davêjin keviya çêm, bin keviran û inikan (kun û şargehên masiyan). Hinga masivan xwe noqî avê dikin û yek bi yek, dudu bi dudu bi derdixin. Carina ji masiyên li pêş

xwe li keviyên tenik asê dikin û hinga di dorhêlê da rûdinin. Bi vî awayî hêdî hêdî qûnxuşki ber ve hev tînin. Gava cih li masiyan teng dibe, dixwazin xwe di nav lingên masivanan da veşêrin. Hinga, nêçirvan destê xwe li ser stoye wan datinin û digirin.

E **çaran, avbirin e**. Ev çîşitê han bi birina ava çeman dibe. Pir çaran zivistanê dema av pir dibe û di çêm hilnayê, di rex çêm da rêne nuh vedike. Havinê gava av hindik dibe, vedigere halê berê. Hinga masivan diçin, û pêşiya avê digirin û li riya nuh siwar dikin. Gava av li ser riya kevin hate birin, masi cih cih di pengavan da û hinek ji li giharê diminin. Wê gavê masivan bi destan pê dikevin û hemiyan digirin.

Herçi berferati, nêçira wan bi piranî dişa di devê çeman da dibe. Ew cihên ko tê da çem dikevîne ser Ferêt.

Bi navê metranê tişteki wekî rîman heye ko berferati pê masiyan dikujin. Metran pişk wekî rimê ye, bi tenê serê wê i dunukul e. Gava masivan davêje mêsi, ko li kijan cihî keve nema bidertê. Bi dawiya metranê va benek heye ko serikî wî benî bi piştê masivan va girêdayî ye. Metran wek ciridan tê avêtin. Dema li mêsi ket û pê da cit bû, masivan serê bînê ko bi piştê xwe va dikişîne û mêsi digire.

Di çemên me da **sê çîşit masî** peyda dibin ko ev in: Ferxe, şawût û gamasî. Masiyên çeman pir mezin nabin; lê goştê wan gelekî xweş e. Di çemên me da kêmasî bi dirêjiya gazekê hene. Lê di Ferêt da heya bi pênc-şes gazan masî hatine ditin.-



Nêçîra kewan

Nêçîra kewan, di welatê Kurdan da bi kitrimi belav bûye; lê nemaze li du cihan gelekî pêş va çûye, qezayên Bêsnî û Gextê. Xelkê van her du qezayên Kurdistanê zîvar û dewlemend, biçûk û mezin vê nêçîra han dîkin. Ev nêçîr bi şeş çîştan dibe; lê gava nêçîra kewan têtê gotin, nêçîra ko kewan li ber kewan digirin an dikujin têtê bîra mirov. Berê, emê vê nêçîrê jî xwandevanên xwe ra salix bidin û pasê vegerin ser her pênc çîştên mayî.

Ev nêçîra han me goti bû li ber kewan dibe ko **sê celeb** in. Dudûyên wan, nêçîra marî û çatiyê bi tîfîngê, nêçîra bestî bi dafan dibe.

1- Nêçîra çatiyê: Catî bi gihandina **du kewan** têtê pê. Ev kewana bi biçûkî têne girtin û xwedî kirin. Dema yeksali dibin dudûyên wan di qufikan da bi hev va girêdîdî; di çîloresan da pê diçin nêçîrê. Ev nêçîr di serê giran, bestan û devê newalan da dibe. Nêçîrvan diçe, kewên xwe li ser hijekê an di nav kevîran da vedîşêre, bi xwe di rex wan da kozîkekê çêdike û têtê da rûdine. Ci gava kewên wî bixwinin, kewên çolê bi dengê wan têtê û dirêjî ser çatiyê dîkin. Hînga nêçîrvan bi tîfîngê kewên çolê dîkuje. Ev nêçîra han nêçîra han di **bîrbanga sibê û serêvaran** da dibe.

Nêçîra mariyê: Marî navê **mêkewê** ye. Dema meha biharê a paşin kew dibin zo û mêkew hêkan dîkin û li ser rûdînin, kewên nêr bi tenê dimînin ko bi wan ra **margîros** têtê gotin. Rojê pê da dibe tiqetîqa wî.



Ci gava dengê **mêkewê** dikeve guhên wî bêtê xweragirtin bi koranî têtê. Di wê demê da nêçîrvanê ko **mêkewa** wî heye diçe wek nêçîra çatiyê bi tîfîngê kewê mergîrosî dîkuje.

Nêçîra bestî: Bestî bi **kewê girêdanê** ra têtê gotin. Her kewek bi kêrî girêdanê nayê. Ev celeb nêçîr carina bi kewekî (anê tenê bi bestî) û carna jî bi du kewan dibe. Bi kewê dudûyan ra **serdar** têtê gotin. Berê nêçîrvan bestî girêdide û li derhêlê dafan dîrêşîne, gava serdar hebe, wî jî li cihekî bilind datîne. Ci dema kewên nêçîrê bixwinin, kewên çolê têtê û rast dirêjî bestî dîkin. Pirên wan berî ko bigehê bestî dikevin dafan. Hînekên wan jî rast bi firekê li ser bestî vedînin ko serê kewan di wir da dest pê dike. Carcaran ser ewçend di nava kewan da xurt dibe ko bestî bi kewê çolê digire û bernade. Qewîmiye ko nêçîrvan kewê çolê di dev bestî da girtiye.

Ji bo nêçîra dafan û tîfîngê **kewê gewr** (kewên çiyayê Evdîlezîzê) e bi nav û deng in. Dema kewê nêçîrê pir qenc dibe, qelenê wî heya bi hêstîrekê, hespeki hêja ya.

2- Nêçîra torê: Herwekî tora masîyan heye, jî bo nêçîra kewan jî celebek tor heye. Ev torên han **perçek**

caw î çarkose ye ko bi dûtê rojînê çînîna li ser çêdîkin û bi ser du darîkên çeprast dîêxin. Nêçîrvan dema kewan li cîkî dibîne tora xwe vedigire, dide pêşîya xwe û di taldî wê da ber ve kewan diçe. Ji ber ko kew nêçîrvên nabînin, dîkin qîşteqîşt û nafîrin. Wekî direndekî bibînin, heya negihê wan jê narevin. Gava nêçîrvan nîzîk dibe, devê tîfîngê di kunîka nîveka torê ra dike û davêjê. Ji vê nêçîra han ra nêçîrvanê sîvîk û sanpaz divê.

3- Nêçîra kaniyan: Kew li ser kaniyan jî pîr têne kustin. Dema paîz têtê û avên hîşkeliyan dimîçiqîn, serêvaran xwe berdîdî ser kaniyên nependî. Hîl nêçîrvan, kozî-nependî. Hîl nêçîrvan, kozî-kên xwe li ser van kaniyan çêdîkin û gelek kewan dîkujîn. Dema vê nêçîrê jî mehekê pîrtîr najo.

4- Qemelax: Gava berf dikeve, berî ko kew jî xwe ra cîhê banî û çêrê bibîne, gundî bi dêstî va derdîkevin qemelaxa kewan. Di berfê da jî birçîna kew jî firekê zêde nikare bifîre. Ji pîranî û nermîya berfê bi lîngan jî nikare bireve, hînga qemelaxvan wan bi destan digirin ko jî vî awayê nêçîrê ra jî qemelax têtê gotin.

5- Sokî: Di barîna berfê da hemî kew cîhên xwe berdîdî û dadîkevin dêstê, ber çeman û av û çîravan, da ko di rêşîyê da bikarî bin biçêrin. Gava dibe bihar û berf li çiyê dihele, kew berê xwe didî cîh û warên xwe. Her refek bi sedan difîrin.

Nêçîra sokînê di her cîhî da nabe. Kozîkên vê nêçîrê nayêne gîharin. Heke kozîk baş û nêçîrvan jî î jêhatî be,

rojê çel-pênci kewî dikuje. Dema vê nêçîrê bi tenê heft-deh roj in. **Kozikin so-kinan hene ko bi qelenê jinekê têne guhartin.** Ew ji weki erd û zewiyan ji milkan tên hesêb.

6- Nêçîra bi teyran: Gava em çêlî nêçîra teyran dikin, her kes dizane ko nêçîrvan teyrê xwe dibe û dema kewan dibîne berdide wan û digire. Lê pir hindik mirov hene ko çîşitên van teyran, awayê girtin û bixwedikirina wan bizane. Ji ber ko min bi xwe teyrê nêçîrê bi xwedî kirine çê û xerab ez hinekî agahî vê yekê me. Ji lewra min divê vê hêla ko ji xwendevanan ra nenas e bidim zanîn.

Teyrên ko nêçîra kewan dikin **pênc çîşit in. Teyrê-res, hulîlk, şahîn, sipir û doxan.** Ji van her pênc çîşitan, her duyên pêşin, yanê teyrêres û hulîlk kedi nabin û bi kêrî nêçîrvanan nayên. Lê her sê çîşitên mayî kedi dibin û teyrine nêçîrvan in.

Ev teyrên han jî, bi çîşitek tor têne girtin. Ev torana di kozikine xweser da têne vegirtin. Kozikên teyran gelekî biha têne firotin ko yek hêjayî qelenê jinekê ye. Xwediyên van kozikan di rojên bi mij û dûman da diçin û torê li ser diwarên kozikê vedigirin. Mirîşkekê di bin torê da datinin û benekî bi lingê mirîşkê va girêdidin û serê bîn bi destê xwe dikin. Dema mij û dûman dikeve dinê û teyrên han jî kêfan radibin fir û gerê, nêçîrvanê teyran hîdî hîdî serê benê ko bi dest da ye kaş dike û mirîşk di cihê xwe da vedi-pirtike. Gava teyr mirîşkê dibîne; di jor da xwe berdide ser î dikeve torê. Bi vî awayî nêçîrvan diçe têyr digire û

her du çavan didirû û tîne mal. Ev teyrên han, li goreyî cinsên xwe tên firotin.

Şahîn, ko kêman caran tê girtin, bihayê wî sî zêrên zer e. Tevî ko teyreki biçûk e, tu nêçîr xwe jê xelas nake. Ev teyr bi kêrî nêçîra qulîngan jî tê. Dema qulîng jî çîyan dadikevin destan û gava vedigerin çîyan, nêçîrvan teyrê xwe bera refê wan dide. Caxa şahîn refê qulîngan dibîne, di jêr va wekî tîrekê, tik hol dibe, heya bi serhêla rêf dikeve. Hînga, berî hemiyan rêberê rêf dikuje. Gava rêberê qulîngan kete xar, êdî ên mayî nema dizanin kû da herin û li bani ref li dora xwe doş dibe. Hînga şahîn wekî nişandarê jêhatî yek bi yek di serê qulîngan da lêdixe û diêxe jêr. Heya qulîngek li bani bimîne, şahîn danakeve. En ko bi şahîn nêçîra qulîngan kirine dizanin ko ev teyrê biçûk çî belayê. Herçî refên kewan in, ne bi awayê refên qulîngan, lê dişa şerpeze dibin. Gava kewê pêşin digire, ên mayî xwe berdidin erdê nav devî û kevîran. Hînga segman tevî seyên xwe wan li erdê digirin. Kewê ko dengê gujîna perê têyr keti be guh heya du saetan diqutife hev û nikare bireve.


Sipir: piştî şahîn teyrê çeleng û nêçîrvantir ev e. Lê sipir, bê kew û kevokan bi kêrî tu nêçîrên mayî nayê. Di gava berdana nêçîrê da ew jî refê kewan bi tevayî diqefilîne. Ji ber ko ew jî kewê pêşin digire û yên mayî jî segmanan ra dihele. Bihayê o bi şahîn nêçîra qulîngan vî teyri **bîst zêrên zer in.**

Doxan: bi qasî şahîn û sipir ne î nêçîrvan e. Ji ber ko çav nade kewê pêşin û carina di

nivê rêf da û pir caran kewê paşin digire. Ji lewra refê ko teyr di ser ra ne firiye bi tevayî naqefile î difilite. Bihayê doxan jî deh zêran bêtir nine.

Awayê xwedikirin û daxistina teyran a nêçîrê jî hewceyî westeke mezin e. Ji ber ko benda me pir dirêj bû min ne xwast ko xwandevanan kiz bikim. Heke rojekê kêş di min keve dê di bin navê (xwedikirin û daxistina teyrên nêçîrê) da benedke xweser jî axayê xwe ra binivîsim.

Ji van celeb nêçîrên me nivîsî pê va jî, dirende, rawir û firende tên kuştin; lê nêçîra wan ne e xweser e. Ji lewra min ne xwast wan jî çîşitên nêçîrê bihejmêrim.



Lo Kurdino !

Ji nişka ve tê dengêki xemgîn,
 ji êşandin û guvastînê tê der,
 ji derdê wendabûnê,
 ji ber babetekî birçibûnê,
 bêçarebûna gelekî;
 ji dest dewarê bê şîr,
 şîrê bê rûn,
 rûnê bê tam,
 tama axû û heznekirinê,
 heznekirina nezaniyê,
 nezaniya nezanan,
 nezaniyê rûresiyê,
 BINDESTIYA ME !
 EM,
 emên tîji kesên li dû navan,
 navên bi rûmet,
 rûmeta li ser stûn û nivekê,
 yan tew li ser qûma derewan.
 Erê,
 ji dest wan hemiyan
 tê dengêki xemgîn û gran :
 EM IN YAR U NEYAR,
 EM IN DOST U DIJMIN,
 EM IN SEDEMA NEXWESIYE, EM IN HEVI,
 EM IN MEREZA RES,
 EM IN DERMAN.
 Erê,
 yan em ê werin guhertin,
 fêrî rêya rast bibin,
 li hevûdin bicivin,
 tev rabin û bikevin,
 yan ji mirina bi qîrîn,
 jiyana bi şîr
 ê bidominin !
 Zanibûn dijwar niye,
 nezani dikare rabe,
 hêvi dikare bizê :
 hêviya jiyaneke tev,
 tevbûneke neteweyeke bextiyar,
 ku têde endam mafê yê din û xwe binase,
 derew û derewin ji holê barkin,
 U
 her kes xwe û hêza xwe nas ke,
 ji ber wan ve şerm neke.

U
 deng car din hat :
 XWE BO WELAT,
 NE WELAT BO XWE,
 TEXIN KAR !
 U
 WELAT BE GEL NE WELAT E;
 gel ji ji merovan pêk tê :
 yê ji merovan hez neke,
 nikare ji gel
 û wisa ji welêt
 hez bike.
 Ta
 roja em li hev û li gel viran bikin,
 yek gora yê din bikole,
 yek ji yê din biheside :
 niye bo me hêvi !
 U
 sedsaleke din ê biçê
 û mirina hêdikan,
 mirina bi jan
 ê bidomine
 U
 heye ku rojekê hestê janê ji wenda be :
 ew e tirsê mezin,
 ew e tirsê mezin,
 ji lewra bi kêmasî,
 ta hestê janê hebe :
 heye jiyan.

Şahinê B. Sorekli
 (VII-87)



Rêzimana Kurdî

(Zaravê Kurmancî)

- XIII -

Mir Celadet BEDIR XAN û Roger Lescot (*)

IV. Nîşank li ser Parekan (2)

Nîşankên Dîrokî

110. Parekên destnîşandanê û yên nebinavkirinê, ku yek ji taybetiyên (xusûsiyyet) zimanê kurdî ne, xuya ye ku pêwendîya wan bi pronavên (zamîr) **yê, ya, yê** û bi rengdêrên (sîfet) nebinavkiri **yek** û hin hatiye kirin (li bend 242 û 245 binêre). Nivîskarê sereke **yê** vê rêzimanê, **Mir Bedir Xan**, li ser vê babetê dozîna (nazariyye) ku li jêr hatiye pêşan dan saz kir.

Yê di Soro,
Yê di qenc,

yê Soro
yê qenc

Ya di wi,
Ya di Soro
Ya di qenc,

ya wi
ya Soro
ya qenc

Yên di wi,
Yên di Soro,
Yên di qenc

yên wi
yên Soro
yên qenc

A) Rayê (esl) parekên destnîşandanê

Divê ku ew bi teşeyên (şikl, awa) avakirî yê pronavê pêşker re bî nêzik kirin : **Yê, ya, yê**.

Nîşeyên jêrîn ewê bihêlin ku em bireke (fîkr) kurt li ser bikaranîna van teşeyan, ku li dûrtir emê vegehin wan, bistînin.

Teseya kevînar Teseya nûjen

Yê di Soro. yê Soro
Yê di qenc. yê qenc

Regezê (unsur) di ku di teşeyên kevînar de xuya dibin, lê ku di teşeyên nûjen de nema ne, daçeka di ku rêzayê (mana) wê weka yê fransîzî de ye (**le cheval de Soro**) ye. Em bala xwe bidin ku hin rojhilatzan dibêjin ku ew di ji suryanî hatiye stendin.

Em nuha bibînin çawa pronavên **yê, ya, yê**, ku ji erkên (wazîfe) xwe yê xwederî (tebîî) hatîne dûr kirin, dibê ku parekên cihê yê destnîşandanê ava kiribin.

1) Nêrê yekejmar

Bikaranîna pronavê pêşker **yê** di hêla ku **yeksaniyê** (paralêl) jêrîn bî ava kirin

Bikaranîna pronav	Bikaranîna parekê
Ev hesp yê di Soro ye.	ev hespê di Soro ye.
Ev hesp yê Soro ye.	ev hespê Soro ye.
Ev hesp yê di qenc e.	ev hespê di qenc e.

(*) Grammaire kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin : Pervin.

Di hevoka (cumle) **ev hesp yê di Soro ye** de, hevgirtinek di nav gotina hesp û pronavê **yê** de, bi ketina **y'ya** ewê dawîn, çêbûye : **Ev hespê di Soro ye**. Pronavê kevn **yê**, ku bi teseya guhêrkera **ê** hatiye kurt kirin, taybetiya xwe hunda dike; di encama (netine) vê yekê de tu têrker nema dikare, li gora mantiq, girêdayî wî bibe; angî **Soro** nema xwe girêdide **hesp** û rola sereke ya **ê** bitenê ya parekeke ku girêdana navbera navê **hesp** û têrkera wî **Soro** dabîn (temîn) dike dimîne. Ji vê yekê rêzayê nuh derdikeve : **Ev hespê Soro ye**.

Di merhela paşîn a pêşveçûna zimên de, daçeka **dî** ji nav vê avabûnê radibe, loma : **Ev hespê Soro ye**.

Bi vî awayî, di navbera du rêzên nîşeyên jorîn de pêwendiyek **ranimayî** (ranima : Zanistiya rayê gotinan. Bi fransîzî : Etymologie) ya gelek mumkun çêdibe. Jixwe baş e ku em ji bir nekin ku lêhûrnêrîna gotinên din ên îranî dihêle ku meriv diyarbûneyekê (hadiseke tebîî) weka ya ku me wafî kiribîne : **Ev xuyabûna i ya ezafet en pazend û ya farîsiya nuh** ku, li gora pêşveçûnekê weka ya jorîn, ji pronavê **hya** yê **farîsiya akemenî tê ye**.

Emê nuha, bi alikariya **nîşeyên** baş, bê ku em vegerin hûriyan, rayê mumkun ê **parekên destnîşandanê yên mêya yekejmar û gelejmar her du zayendan** (cîns) nîşan bidin.-

2) Mêya yekejmar

Teseyên rayî	Wekhevên wan
Ev mehî ya di Soro ye, ev mehî ya Soro ye.	Ev mehîna di Soro ye, ev mehîna Soro ye.
Ev mehî ya di qenc a, ev mehî ya qenc a.	Ev mehîna di qenc a, ev mehîna qenc a.

3) Gelejmar her du zayendan-

Teseyên rayî	Wekhevên wan
Ev hesp yê di Soro na, ev hesp yê Soro na.	Ev hespên di Soro na, ev hespên Soro na.
Ev hesp yê di qenc in, ev hesp yê qenc in.	Ev hespên di qenc in, ev hespên qenc in.
Ev mehî yê di Soro na, ev mehî yê Soro na.	Ev mehînan di Soro na, ev mehînan Soro na.
Ev mehî yê di qenc in, ev mehî yê qenc in.	Ev mehînan di qenc in, ev mehînan qenc in.

4) Bikaranîna daçeka di piştî pareka destnîşandanê

Bikaranîna vê daçekê piştî parekên destnîşandanê yên nêr û mê yên yekejmar di rojên me de gelek kêr bûye. Carî meriv di bêjeya (edebiyat) zanyarî de rastî wê tê, lê bitenê weka serbestiyeke helbestî.

Di vajayê wê de, bikaranîna di piştî daçeka destnîşandanê ya gelejmar di gelek peyvikan de, nemaze di navçeyên ku meriv tê de hin bûye ku n'ya ên bi lêv neke, pirr e. Icar hebûna di dihele ku meriv nêrê yekejmar ji gelejmarê her du zayendan cihê bike.

Nîşe :

Hespê Soro (yan hespê"n" Soro).

Hespê di Soro dêlva hespên Soro
Mehinê di Soro dêlva mehinên Soro

Di hin welatan de, nemaze li Behdînanê, daçeka di xwe bi pareka destnîşandanê ya gelejmar digire, û bi vî awayî eva dawî dibe -êt.

Nîşe :

Hespê Soro dêlva hespê di Soro
Mehinê Soro dêlva mehinê di Soro

Nîşank : Pîranavên yê, ya, yêr ku xwe bi nava bi teseyên -ê, -a, -ên girtine, ji ruh de ji wan veqetiyar ji bo ku werin pêşîva rengdêran û ji wan re rêzayê mekhevên wan ên fransîzî ku bi le, la, les tîr pêskes kirin dibin.

Nîşe : ê qenc, a qenc, ên qenc.

Em bala xwe bidin ku hin peyvik (weka Botan) di vî rewşê de bikaranîna yê, ya, yêr dewam dikin.

Nîşe : yê qenc, ya qenc, yêr qencyên dewam dikin.

Nîşe : yê qenc, ya qenc, yêr qenc dêlvaê qenc, a qenc, ên qenc

B) Rayê parekên nebinavkirinê

1) Pareka nebinavkirinê ya yekejmar

Ew bitenê teseyê guhêrker a rengdêra jimarî yek ku bi rakirina y'ya pêşî sîvikkirî ye ye.

Nîşe :

Yek hesp : hespek
Yek mehin : mehinek

2) Pareka nebinavkirinê ya gelejmar

Ew ji, weka ya jorî, ji rengdêra nebinavkirî hin tê.

Nîşe : Hin hesp : hespin
Hin mehin : mehinin

Xuya ye ku pareka nebinavkirinê ya gelejmar hinek nuh e : Bi rastî, hin peyvik wê gelek kêr bi kar tînin û avahiyên hin hesp, hin mehin, ku di eynî zemanî de rêzayê xwe yê rayî (çend hesp, çend mehin) jî hîstine, çêtir digirin (tercîh dikin).

Lê divê ku em bir bikin (bifikirin) ku hebûna pareka -in hin di Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de (1061 H.) hatiye

CEGERXWÎN

CÎM Û GULPERÎ

JÎ KEÇ Û XORTAN RE

DIYARÎ

KOMIXA KARÊ QANDI (KKQ)

pejirandin. Weka nîşe, ev nivîskar ewha dinivîse :

Mirin hene, aqîl in, ezîz in.

C) Rayê teşeyên ku bi parekên nebinavkirinê avakiri ne

Dewambûna hin teşeyên kevnar, di hin

peyvikên pirr muhafazakar de, dihêle ku meriv bir bike ku teşeyên avakiri **-ekî, -eke, -ine** yên pareka nebinavkirinê bite-nê pisti teşeyên wê yên sade (**-ek, -in**) bi demeke dirêj xuya bûn.

Di rayê parekên nebinavkirinê yên avakiri de, meriv teşeyên kevnar ku tê de hin ji pronavên **yê, ya, yê** hene dibîne.

TESEYEN KEVNAR	TESEYEN NUJEN
1) Nêrê yekejmar	
Hespek yê di Soro, hespek yê Soro	Hespek di Soro, hespeki Soro
2) Mêya yekejmar	
Mehinek ya di Soro, mehinek ya Soro	Mehineke di Soro, mehineke Soro
3) Gelejmarê her du zayendan	
Hespin yê di Soro, hespin yê Soro	Hespine di Soro, hespine Soro
Mehinin yê di Soro, mehinin yê Soro	Mehinine di Soro, mehinine Soro

Teşeyên jêrin, ku hin ji di peyvika Hevêrkan (Tor Abdîn) de tên pejirandin, dibe ku nîşan bidin ku çawa dawîneyên parekên nebinavkirinê, di rewşa avakiri de, xuya bûn : **î** (ji bo nêrê yekejmar), **e** (ji bo mêya yekejmar), **en** (ji bo gelejmarê her du zayendan) :

Yek hespi Soro dêlva hespeki Soro
Yek hespi Soro dêlva hespeki Soro

Yek mehine Soro dêlva mehineke Soro

Hin hespen Soro dêlva hespine Soro
Hin mehinên Soro dêlva mehinine Soro

Dawîneyên -î, -e û -en, ku meriv di **Dawîneyên -î, -e û -en**, ku meriv di nîşeyên jorîn de dibîne, bûn **pasdaniyên** parekên **-ek û -in**, ji bo ku **-ekî, -eke û -ine** bidin. Ketina n'ya dawîn, ji bo gelejmarê (**-ine, dêlva -inen**) tên dîtîn; bê gûman sedema wê ev e ku ji bo ku gelejmarîya wê ji berê bi **-in** hati bû nîşan dan, ev diyarbûne (hadîsa tebîî) pêwîst namîne.

Hin ji avahiyên ku me li jor weka kevnar nîşan dan, di hin navçeyên Botan de hin ji jindar in. Meriv dibêje :

Hespek yê Soro dêlva hespeki Soro-

Hespek yê qenc dêlva hespeki qenc

Mehinek ya Soro dêlva mehineke
Soro
Mehinek ya qenc dêlva mehineke
qenc

Heta, di nav van navçeyan de, carna tê
gotin : **Hespek Soro hebû, mehinek
Soro hebû** (dêlva hespeki Soro hebû, yan
hespek yê Soro hebû). Ev rakirina hemî
regezên (unsur) girêdanê di navbera navê
nebinavkirî û têrkera wî de **qet ne rast e**
û tucar ji aliyê zimanê nivîsinê ne hatiye
pejirandin.

Di eynî peyvikan de, û di yê ku ji avahiya
hin **hesp** (dêlva hespin) re xwebextker
(fedakar) dimînin de, pareka nebinavkirinê
ya gelembar ya avakirî bi pareka destnî-
şandanê ya eynî jimarî tê guhertin û
rengdêra nebinavkirî hin tê pêşiya nav.

Nîşe :

Hin hespên Soro dêlva hespine Soro
Hin mehinên Soro dêlva mehinine
Soro

Ev teşe li gora rêzayê hevokê tên bi kar

anin, weka çend hespên Soro, çend
mehinên Soro, yan hespên ku em nas
nakin.

Tiştê ku vekirî ye ku meriv tucar nabêje
hin hespine Soro, ji bo ku eynî nav
nikare du caran bibe nebinavkirî
(carek bi hin, û carek bi -in).

*Nîşank : Dawîneyên -î û -e yê parekên
nebinavkirinê yê avakirî dikarin bi avakirî
tenha li pêşiya rengdêran bên bi kar anin.*

Nîşe :


Ev hesp î qenc e, ev mehin e qenc e.

*Ji bo gelembarê, ev vê rolê dilîze :
Ev hesp en qenc in.*

*Emê li dûrtir vegehin cihêtiyên piçûk ku
Emê li dûrtir vegehin cihêtiyên piçûk ku
di bikaranîna ê, a, ê û ya î, e, en de hene.*

Pêşgotî : Du parên xizaniyê nezani
ye.

Dûmahî heye



X e b a t a m e

30 NISAN

Cêjna 1'ê Gulanê, ku ji aliyê P.O.S. (Partiya Karêran a Sosyalîst) hat pêk anîn. Em bi raxistina belgeyên kurdî besdari wê bûn.

1 GULAN

Cêjna 1'ê Gulanê ya **Partiya Kommunist a Beljîkî**: Li wê derê jî, me pirtûk û kasetên kurdî raxistin.

1 GULAN

Cêjna 1'ê Gulanê ya **Partiya Kar a Beljîkî**. Cardin, em bi raxistina belgeyên kurdî besdar bûn.

2 GULAN

Nûnerek ji Têkoşer ji aliyê **Zanîngeha bajarê Antwerpen** (Anvers), Beşa Aboriyê, hat vexwendin (dawet kirin), ji bo ku agahdariyekê li ser Kurdistanê bide xwendekarîne ku ji cihana siyemîn hatine. Beşdar 20 kes bûn. Piraniya wan Afriqî û Latîni-Amerîkî bûn. Xwendekarek tenê Asyayî - Hindonezya - bû. Piştî axaftinê, wan pirsên gelek balkêş pirsîn û belgeyên cihê kirin.

5-6 GULAN

Civîneke du rojan, li

Parlementa Ewropa, li Brukselê, li ser **pirsa vîzayên** ku hin welatên Ewropî ferz dikin **derhatî** (muhaçîr) û **penaberên** (multeci) **ne ewropî** ne. Ev civîn ji aliyê **Koma Keskên Alternatîf** hati bû pêk anîn. **Hestê kes**, ji welatên ewropî yên cihê, besdari wê bûn. Piştî gotûbêjên dirêj, me bîryar stand ku di meha **Hezîranê** de, **protêsto-** yên mezin li ser sinorên Almanya, Fransa, Beljîka û Hollanda, di eyni rojê de çêbibin. Ji derveyî pirsên vîzayê, li ser nedadiyên (neheqî) ku, bi awakî gîştî li ser derhatiyên ne ewropî û cihêtiyên ku di navbera wan û yên ewropî (Italî, Spanî,...) de tên kirin hat axaftin. Endamêk ji **Têkoşer** jî li ser **cihêtiyeke duyemîn** ku di navbera derhatiyên ku **netewahiya** (cinsîyyet) wan heye û yên ku **bê netewahi** ne, weka Kurdan, peyivî. **Wê çar mafan jî bo Kurdên ku li Ewropayê dijîn xwestin** : 1) **Alikariya aborî** jî bo rêxistinên çandî yên kurdî. 2) **Bernameyên kurdî yên bipergal** (mun-

azam) di radyo û televizyona de. 3) **Hînkirina zîmanê kurdî** - ne tirkî - di dibistanan de, ji zarokên kurd re. 4) **Pejirandina** (qebûlkirin) dayîna **navên kurdî** - ne tirkî - ji nuhziyên kurd re. Hin saredarî (belediye) navên ku ne di lista ku sefaretxana Tirkîyê pêşkêşî wan dikê de nê pejirîne.

7 GULAN

Têkoşer **Konsereke Kurdî**, ji bo **biranina Nijadkujîya Halabca**, li Passage 44, li Brukselê, pêk anî. Hatina sevê jî rêxistina bijîjkên (doktor) serbixwe **Médecins Sans Frontières-Belgique**, ku çû bû Halabca, re hat dayîn. Di bername de : **Dahol û zurne, Koma Nîştîman, Zozan, Birader û Sivan hebûn** (li rûpel binêre).

16 GULAN

Parlementerê Ewropî, Willy Kuypers, û **Dr Heyndrickx**, **mutexessîsê**

Agahdari

Kovara Têkoşer, ku bû nêzikî **deh sal** e bi awakî muntazam derdikeve, di meha Gulanê de ji aliyê **Federasyona Presse Périodique** hat pejirandin (qebûl kirin).

navnetewî yê kartêkirinên (tesir) **çekên şimik** ku çûbû Halabca, civîneke çapê li I.P.C. (International Press Centre) li **Brukselê**, ji bo protestokirina firotin û **bi-karanîna** van çekan, pêk ani (li rûpel binêre).

21 GULAN

Em beşdar bûn rojekê bi navê **"8 saet ji bo Halabca"** ku ji aliyê **Kurdên Leuven** hat pêk anin. Ji saet 14 heta 20, **wêne**, **filmên vidêo**, **diapozitiv**, **axaftin**, **dosya** li ser vê nijadkujîya mezin hat pêş-kes kirin (li rûpel binêre).

23 GULAN

Komeke cuhanan ji **Berlîna Rojava** hat **serdana** (ziyaret) **Têkoşer**. Ev serdan di çarçeva hefteke gerr li **Beljîka** çêbû û ew ji aliyê **rêxistina Commission Européenne Immigrée** hat pêk anin. Ev kom ji katjimêr (saet) 17.30 heta nivêşevê li komela me ma. **Pistî xwarineke kurdi ya xweş** (savar û tirşik), em dûr û dirêj li ser pîrsa kurdi peyivîn û bersivên pîrsên wan dan. Ev beşdar **10 kes** bûn : **8 Alman**, **1 Tirk** û **1 Yûnanî**.

28 GULAN

Festîvala Derhatiyan li bajarê **Anvers**. Em bi raxistina belgeyên kurdi beşdar bûn.

DOSSIER KURDISTAN

TÊKOŞER, Union des Travailleurs et Etudiants Kurdes en Belgique

DI MEHE DE CAREKE

- **Civînen Koordînasyona Mafên Mirov û Gelan.**
- **Civînen Mafê Helbijartînen Saredariyî** (ên bele-dîyan) ji bo **Derhatiyan** (muhacir).
- **Civînen Komîta Pistgîriya Penaberên** (multeci) **Tirkîyê.**

W E S A N

Bi hinceta (munasebet) **40 salîya Daxuyanîya Cihanî ya Mafên Mirovî ya ONU** (**Rêxistina Neteweyên Yekbûyî**), me dosyekê bi fransîzî **"Dossier Kurdistan"** dmeha Adarê de weşand. Ev dosye ji **132 rûpelan** pêk hatiye û tê de **wêneyên dîrokî** yên gelek xweşik çap bûne. Ew gengazîyeke (wasîteke) nivîskî ya nasandina pîrsa kurdi, ji aliyê dîrok, çand, rewşa gelê kurdi a îroyîn, li **Kurdistanê** û li **Ewropayê**...., ji **Ewropî** û **biyanîyan re**, ye.

Ji bo **pistgirtina** vê xebata agahdariyê, **34 sexsiyyet** û **rêxistinên beljîkî** û **navnetewî** navê xwe danî destpêka vê Dosyê. Em wê bi awakî gelek fireh belav dikin û difiroşin. **Buhayê wê** : li **Beljîka 200 F.B.**, û li **welatên din 250 F.B.** ye. **Pistî çend mehan**, ewê bi **hollandî** û **paşê bi îngilîzî** jî derkeve.



Têkoşer'den haberler

30 NISAN

Sosyalist İşçi Partisi (P.O.S.) tarafından düzenlenen 1 Mayıs bayramına informasyon sergimiz ile katıldık.

1 MAYIS

Belçika Komünist Partisi tarafından düzenlenen 1 Mayıs bayramına informasyon sergimiz ile katıldık.

1 MAYIS

Belçika Emek Partisinin düzenlediği 1 Mayıs bayramına informasyon sergimiz ile katıldık.

2 MAYIS

Anvers Üniversitesi Ekonomi Fakültesi tarafından, Kürdistan hakkında bilgi vermek için, Têkoşer'den bir temsilci davet edildi. Seminere Afrika ve Latin Amerika ülkelerinden 20 kadar öğrenci dinleyici olarak katıldı.

5-6 MAYIS

Bazı Avrupa ülkelerinin mültecilere farz etmek istedikleri vize konusunda Avrupa Parlementosunda düzenlenen iki günlük toplantı. Toplantı, Alternatif yeshiller gurubu tarafından düzenlenmişti. Toplantıya çeşitli Avrupa ülkelerinden 80 kişi katılmıştı. Fransa, Alma-

nya, Belçika ve Hollanda sınırlarında protesto gösterilerinin düzenlenmesi kararı alındı.

Vize konusunun yanısıra yabancılardan sorunları hakkında tartışıldı. Têkoşer'den bir temsilci toplantıda, milliyet kabul edilenler ile kabul edilmeyenlerin - Kürtler gibi - karşılaştıkları sorunları konuştu. Avrupa'daki Kürtler için 4 istekte bulundu : 1. Kürt kültürel örgütleri için maddi yardım. 2. Radyo ve televizyonlarda muntazam bir şekilde Kürtçe programların yayını. 3. Kürt çocuklarına okullarda Kürtçe dil öğretimi. 4. Yeni doğan Kürt çocukları için Kürtçe isimlerin kabulü. Kürtçe isimlerin belediyeler tarafından resmen kabulü.

7 MAYIS

Têkoşer, Halebce katliamını anmak için, Brüksel Passage 44'te bir konser düzenledi. Programda davul zurna, Koma Nistiman

Folklor Ekibi, ozanlardan da Zozan, Birader ve Sivan vardı (sayı. bak).

Çeşitli milliyetlerden katılanlar oldu. Gecenin geliri Médecins Sans Frontières-Belgique (Uluslararası Tabibler Birliği) vasıtasıyla Halebce kurbanlarına gönderilecek (sayı. bak).

18 MAYIS


Avrupa Parlementosu üyesi Willy Kuypers ve Halebce'ye araştırma için giden kimyevi silahlar mühendisi Prof. Dr. Heyndrickx Brüksel'de, Uluslararası Basın Merkezinde (I.P.C.) kimyevi silahların imalat ve satımının yasak edilmesi için bir basın toplantısı yaptılar (sayfa bak).

21 MAYIS

Leuven Kürtleri tarafından Leuven'de düzenlenen "Halebce için 8 saat" isimli eyleme katıldık. Saat

Duyuru

Mayıs 1988 de aşağı yukarı 10 senedir yayın hayatını aralıksız sürdüren Têkoşer dergisi Belçika Periyodik Basın Federasyonu tarafından resmen kabul edildi.-



14'ten 20 ye kadar Halebce katliami ile ilgili resim, film, video, diapositif ve dosya gösterileri yanında tartışmalı bir seminer oldu (sayfa bak).

23 MAYIS

Berlinden bir grup genç Têkoşer'i ziyaret etti. Commission Européenne Im-migrée tarafından Brüksel'e davet edilen gençler Brüksel'i bir hafta boyunca ziyaret ettiler. Grup saat 17.30 dan 24 e kadar Têkoşer'de ağırlandılar. Misafirler geleneksel bir Kürt yemeği verildi : savar û tirsik. Kürt sorunu uzun uzun konuşuldu. Grupta 8 Alman, 1 Yunan, bir de Türk vardı.

28 MAYIS

Anvers Göçmen İşçiler Festivaline informasyon sergimiz ile katıldık.

AYDA BİR

- İnsan ve Halkların Savunmak için Koordinasyon örgütü toplantıları.
- Belediyelerde göçmenlerin seçme ve seçilme hakları toplantıları.
- Türkiye'li mülteciler ile dayanışma komitesi toplantıları.

YAYINLARIMIZ

Dossier Kurdistan (Kürdistan Dosyası). Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Kuruluşunun 40ci yıldönümü dolayısıyla, mart ayın-

da Kürdistan ile ilgili Fransızca bir dosya yayınladık. 34 Uluslararası ve Belçika'lı tanınmış şahsiyet ve örgütler dosya çalışmalarımızı desteklediler. Biz isimlerini bu dosyanın başına eklemişiz. Dosya 132 sayfadan ibarettir. Tarihi ve güncel, önemli fotoğrafların içinde yer aldığı dosya Kürt sorununu tanıtmak, tarih, kültür, Kürdistan ve yurtdışındaki Kürtlerin durumunu içerir.

Dosya Avrupa'lı ve yabancılarla dönük hazırlanmış. Geniş çapta dağıtımını yaptığımız dosya Belçikada 200 ve dışarıda 250 Belçika Frankına satılıyor. Yakın bir zamanda dosyanın Hollandaca ve İngilizce baskıları da çıkacak.

D O S S I E R

KURDISTAN

**TÊKOŞER, Union des Travailleurs et
Etudiants Kurdes en Belgique**